

da çûk bûne serdest û desthilatdar? Çira Padîşahê Osmanî Avdilhamîd bi xortên Kurdan, Alayîyên Hamîdî damezrand, bi destê wan qira gelê Ermenî, Kurdên Êzîdî, Elewî û Sûryaniyên Xaçparêz anî? Çira îro di ciyê bilbil, şalûl û kewan de kund, ango bûmê kûr dixwînin, beraz tijî bûne? Çira Şêx Memûd Berzencî û Simko Axa hatin xapandin? Çira Mistê Kûr ew xapandin, kirin dijberê Îngîlîz, bi xwe jî bû yar û dostê wan, û dewletek namerd û zalim li ser tunebûna me Kurdan damezrand? Çira 72 gelnişên Kurd, -ku ew bi deng û viyana gelê Kurd ve neçûbûna wê meclîsa zalim û barbaran- ango parlamenterên Kurd ji Konferansa Lozanê re name şandin, û gotin “ev dewleta, dewleta me Kurdan û Tirkan e?”. Çira Kurdistan kirin çar parçe, pergala me belav kirin, û em kirin xulam û bindestê sê zaliman?.

Bawer bikin rewş û tevgera me Kurdan gelek balkêş e. Em ji keçek xwe, a ku bi xwasteka dilê xwe bi yekî Kurd re direve, em diçin wî xortî dikujin, dibin dijminê wê malê û dû re jî, ji hev tol û qesas distînin. Lê, yên ku bi sed hezaran bav û kalên me kuştine, îro me ew ji xwe re kirine dost, heval û yar, ji xwe ra kirine rêber û pêxember. Ez ku bibêjim “Em Kurd ji celatên gelê xwe hez dikin û dihebînin” ,bibe ku gelek Kurd bixeyidin, lê mixabinev rastiyek berbiçav e. Aha ji we re îro Kurdên Dêrsimê, ku Mistefa Kemal li Dêrsimê heftê hezar (70.000) Kurd, zar û zêç, pîr û kal, jin, keç û bûk kuştin, lê îro Kurdên Dersim bi serê Mistê Kor sond dixwin, û wî dihebînin.

Belê, li ser vê rewşa me, -di nav demek xweş de be- Îsmail Bêşikçî gelek tiştên xweş û berbiçav nivîsî ye.

Xwendevanên hêja, pirs gelek in, lê ez naxwazim pir dirêj bikim, werim ser hin

pirsên îro. Çira çar hezar gund hatin şewitandin û kavilkirin û pênc-şeş milyon Kurd bûn koçber çûn ketin ber çerxa asîmîlasyonê, ango helandinê? Çira 90 hezar Kurd bûne parêzkarê dijmin? Çira şerê birakujiyê destpê bû, û bi hezaran Kurdan hevdu kuşt? Çira heya roja îro hemû hêzên Kurd, yên ramiyarî di nav xwe de Konseyek Neteweyî saznekirin û pêknanîn? Çira di nav hêzên Kurd de nakokî hêj berdewam e? Çira heya roja îro Kurdan dost û dijminên xwe ji hev cihê nekirine, li hev qelibandine?

Xwendevanên hêja ew kesê ku dost û dijminê xwe nasneke, riya mala heval û hogirekî nabîne. Ji ber vê yekê divê êdî em gelê Kurd dost û dijminê xwe ji hev cihê bikin, da ku em bi serkevin. Ango piştî evqas şaşî û çewtiyan, piştî evqas sal û sedsalan ,divê em hişê xwe bînin serê xwe, bi xwe bihesin û xwe nas bikin, ji hevra bibin bira, dost û yar.

Xwendevanên xoşewîst, berê ku ez dûmayî bidim vê nivîsa xwe, dixwazim ji we re qal û behsa gotin û fermanek Peyxamberê ola Îslam û kurap û zavayê wî Elî bikim. ?

Ez werim ser fermana Peyxamber, û wî ji Elî re çi gotiye û Elî çi kiriye? . Rojekê Mihemed ji Elî re: Elî, îro şuve bikeve nav gel û bala xwe bide ser gotinan. Eger ku te dît kesek sê derewan li ser hev dike, yekser lêxîn bikuj, sêrî jêke” dibêje. Êhh, Peyxember ferman kiriye, divê Elî fermana Peyxamber bîne cî.

Rojekê Elî li Dundulê siwar dibe - Dundul di rastiyê de ne hesp e, qantir, ango kerbav e- li Mekê derdikeve, dinêre ku kawranekî hêştiran berbi bajêr tê, li pêş kawrên **D.R.(11)**